MYNDIGHETEN FÖR TILLGÄNGLIGA MEDIER

# Girîng e tu derbarê Legimus de agahdar bî

Ger tu xwedî astengiyekî fonksiyonî (kêmasiyekî) yî ku xwendina nivîsên çapkirî ji te re dijwar dike, mafê te heye ku tu pirtûkan bi awayekî ku ji te re guncaw be bixwînî. Daîreya Medyayên Gihîştbar (Myndigheten för tillgängliga medier), bi vê armancê hatiye tayîn kirin ku ev tişt mimkîn bike. Ji ber vê yekê pirtûkxaneya dîjîtal a bi navê Legimus heye.

Ji bo ku tu di Legimus de pirtûk bixwînî û bi kar bînî, ev şert tên ferz kirin:

- Tenê kesên ku xwedî astengiyekî ne ku xwendina nivîsên çapkirî ji wan re dijwar dike, dikarin Legimus bi kar bînin.
- Divê tu agahdariyên rast bidî derbarê sedema ku tu hewceyê bikaranîna Legimus î. Ger tu bi zanebûn agahdariyên şaş bidî, mafê te yê bikaranîna vê xizmetê dikare ji te were standin.
- Kesên din nikarin bi têketina (login) te pirtûkan di Legimus de bixwînin. Ger ev tişt çêbibe, dibe ku tu ji hesabê xwe yê Legimus werî asteng kirin.
- Pirtûkek ku tê daxistin wekî emanet tê hesibandin. Piştî 6 mehan divê tu bi xwe van pelên daxistî jê bibî.
- Firotin an dayîna pirtûkên ji Legimus ji kesên din re neqanûnî ye.
- Ger tu mala xwe bar bikî an dev ji xwendinê berdî, divê tu derbasî pirtûkxaneyeke nû bibî ku li cihê ku tu niha lê dijî an dixwînî heye. Pirtûkxaneya nû dê alîkariya te bike ku tu bikarîbî bikaranîna Legimus bidomînî.

Ji bo zêdetir agahdariyê li ser qanûn û şertên ku derbasdar in, li peymana bikarhêneran binêre.